

Gustîl

Ji mêj ve di tiliyan de ye. Dîroka peydabûna wê ne xuya ye. Lê wek nîşane dihate bikaranîn. Ji hêmanên cûr bi cûr wek zêr, zîv, mis (Sifir) û carina polad tê çêkirin. Zêr nîşana destgirtî û zewacê ye. Nîşana sozdariya evîndaran, ku li ser peymanên hev bimînin û bi vî awayî bi dîtî û hesîna gustîlkê tim li bîra evîna xwe bin. Gustîl sembola xwedîtî ye.

Li sedsala 15`an de, li Îtalyayê gustîl ji hêma zîv bû ku carina nexş û nîgaran li ser nitirandin û helbet ên dewlemendan bi elmasek ku lê bicih dikirin dihate xemilandin. Ew nîşana hêzê bû. Hêza girêdana peymanên nav jin û mêr.(1)

Her wusa baweriya cotkarên welatê Îrlandayê li rojavaya Ewropayê, ew bû ku bê gustîl zawac çê nabe û rewa nîne. Bo rêzdana roj û heyv du meydanên fire ku xizma bûk li meydanê roj û yê zava li meydanê heyvê kum dibûn. (2) Hema bêje wek çanda kurdan berbûk û xwendî erk dara guhestina gustîlka bûk û zava bû û wisan zewaca van destpê dibû.



Li nimûneka din keça ku qezda mêrkirina wê hebû li dewra kevirekî, heyv navlêkirî, dizivîrî û xort jî herwisa li dewra kuçekî, roj, navlêkirî dizivîrî, piştî li hember kuçekî, Odîn (Xwedayê hêz), navlêkirî digihiştin hev, gustîlkên xwe ji qulekî hundur wî kevirî dikirin destên rastê. Gihştina xort û keç bi hev re û gustîl li tilî kirin dihate vî wate ku ew êdî jin û mêr in. Gava mebest berdan û telaqê bû jî pirr hêsan dihate kirin, wiha ku jin û mêr bi hev re diçûn hundur dêrê (kenîşte) ji bo derketinê her yek ji deriyên cuda derbas dibûn û gustîlk ji nav tiliyên xwe derdixistin. (3)

Li welatê Îslandayê gustîlk ne wek pîvana îro bû, lêbelê ewçend mezin bû ku bi çar tiliyan re derbas dibû û digihişte mistê.

Li hinek malbatên Îngilistanê jin bi xwe gustîlk dikirî û li tiliya xwe dikir.

Li gor lêkolînên îro guhestina gustîlk, vedigere bi 4800 sal berî niha ku li Mesra mêjûyî de bû. Pejirandina gustîl ji aliyê keç li çanda Rûmiyan de wateya pejirandina zewacê bû. Wusan e ku îro li dêr û kenîşte jî destûra olî emir dide ku keç bihile ku mêr gustîlê li wêderê bike tiliya çaran a desta çepê. Gerçê li hinek welatan wek Alman, Nurvêj û Şilyê, gustîlê di desta xwe ya rastê dikin.



Carina gustîla zewacê diçe şûna gustîla destgirtî û ev gustîlk dikin destê rastê. Li hinek beşên ji Ewropayê jî gustîlka zewacê diçe li ser gustîla destgirtiyê de û divê her dû li tiliyekê bin.

Li hinek baweriyên de sedema tiliya çaran yan tiliya gustîlkê (Babeluç) rehikê xwînê (Şîndemar)⁽⁸⁾ ye ku jê re xwerû diçe dilê mirovî. Ev rih, riha evîn e.

Baweriyên din dibêje ku vê tiliyê kêmtir ji tiliyên din bikar tê.

Li skandînaviya jî edetek heye ku jin 3 gustîlkan li tiliyên xwe de dikin. Yek ji bo destgirtî bûn, yek zewac û ya dî ji bo dayik bûnê ye. Bûkên cihû gustîlkê li tiliya nişandekê dikin, ew ku li gor pirtûka pîroz a Tewratê hatiye xwestin.




Heta sedsala 20`an de pirranî jin bûn ku gustîl li tiliyên xwe dikirin. Ev dikare wusan be ku çawa jinên zewicî yên Tirkmen kumek biçûk li sersera xwe û bin kevnê sêrî datînin. Sedem ev e ku hemî bizanin wê mêrkirî ye û tê parastinê, Gustîl sembola parastina jinan e.

Li Ewropayê de li pey destpêka şerê cîhanî yê duyem û dûrketina mêran ji hevserên xwe ve, gustîlê wek bîranîn û nîşana balkêşiya wan bi jin û malbat tê nas kirin.

Gustîl li nav Kurdan da

Li nav çanda me Kurdan de gustîl, ji mêj ve cihê xwe nav tiliyên evîndaran û sozdarên peyda kiriye. Wek çawa, di destana Mem û Zîn, helbestvanê mezin û navdarê Kurd, Ehmedê Xanî ji guhestana gustîla Mem û Zîn axifiye. Li şûna gustîlê, “Enguşterî” û “Xatem” hatiye nivîsîn. Xanî di beşê I4’an ê “Mem û Zîn”ê da qal kirîye ku di şênayîya cejna Newrozê da Memê û Tacdîn li Zînê û Sitîyê rast hatine û bi evîna wan bêhiş ketine. Her du xuşk çûne ser wan, ew jî bi evîna wan derdedar bûne û gustîlên xwe bi yê wan guhartine. Xanî li ser wê rewşa wan weha gotîye:

*Sersal û xweşî ji dest bi der dan
Eyşê xwe bedel kirin bi derdan
Eyşê xwe bedel kirin*



Şevêkê çû raza û di xewna xwe da qîza Mîrê Cizîra Botan Mîr Zengîn, Zîna Zêdan dît. Zîn keçek pir bedew bû. Di xewnê da Mem û Zîn gustîlên xwe bi hev guhertibûn. Gava Mem ji xewna xweş şiyar bû, li ser gustîla xwe navê Stîya Zîn dît. Zînê jî wê şevê xewnek waha dîtibû. Li ser gustîla wê jî sûretê Mem hebû.

Ji pirtûka Mem û Zîn:

*Enguşterîyêd wan ciwanan
Kêşan ji esabiêd xwedanan*

*Ev xatem, yê di wan kuran in
Van jî du nigîn di destê wan in (4)*

Piştî herêkirin û pejirandinê, şîranî yan nîşanî çê dibe. Ev bûyer ku bi vexwarina şerbet û şîranî û şeker şikandinê pêk tê, li mala bavê bûkê ye. Gustîlkekê dikin tiliya keçikê û qatek kinc û cotek sol jî didin wê.

Li dorhila bajarê akrê piştî şîranîyê aliyê lawik qatek kinc û gustîlkeke din dibin mala bavê keçikê, gustîlkê dikin tiliya wê û şahiyek biçûk çêdikin.

Piştî dawetê, sê hefte paşê, ev car ji mala bavê bûkê çend kes bi sêniyek kilorik û nanên nav rûn (Hevrîşk) ve tîn mala zavê. Ji bo zeyî rêdan (Îzn keçikê hilgirin). Bûkê li hespekî siwar dikin û dibin mala bav. Mêvaniyek germ û bi coş li mala bavê bûk çê dibe û di dawiyê de, mala xzûr xelatan didin bûk zava û birazav. Yê birazava biçûk e, lê yê bûk û zava mezin e. Gelek caran li merasima zeyî ji bûk re zêrek an pezek û ji zavê re jî saetek an jî gustîlkeke zêr didin.(5)

Li nav Kurdên Êzdî jî gelek caran gustîlkên bi wêneyê tawis dikine tilîyên xwe, û jinên Êzdî jî gustîl û xişirên (Guher) ji zêr yên bi wêneyê tawis bi kar tînin. (6)

Li navça Xorasanê hengulîsk (Gustîl) a bûkê ji aliyê malbata xort yan zava tê kurrîn û ya zava jî li stûyê malbata bûk e. Gava li şîranî şeker tê şikandinê û Aqid xutba eqdê xwend, êdî bûk û zava bi hev re helal in û dikarin destê hev bigirin vêca gustîl tîn guhertin û divê bi tiliya ku hengulîsk tê da hatiye kirin bi lêva hev hinguv bidin. Bûk li wê pîr şerm dike lê zava tiliya wê gez dike.

Ji pirtûka Sêxiştîyên Xorasanê

*Te ku degût ez mêr nakim
Engûşterê xwe zêr nakim
Caylê xelkê bêdil nakim*

*Ez şivanê kavir, gîskan,
Diçêrînim dora nîskan,
Sa te tînim hengulûskan.*

*Engûşterê te heqîq e,
Min sa tera kire dîx e,
Nivîsîne exd û sîxe.*

*Engûşterê te tela ye,
Gepkirinê te sela ye,
We derdê te mubtela ye. (7)*



Navên din ên gustîlê: Gustirk ,Gustirik ,Gustîlik ,Gustîlk ,Gustîr ,Gustîrik ,Gustîrk,
Hengulîsk, Hengustîl, Hengustîlk, Hengustîr, Hengustîrk, Hingustîl, Bistîl, Bistîlk,
Engulîs, Engulîsk, Engustîl, Eengustîle, Hengulîs.

Berhevkar: Ebas Ferhadî Topkanlû

- (1) The Renaissance (1992) ISBN 0-00-215411-0
- (2) Rogers, Jonathan (2010). Saint Patrick. ISBN 978-1-59555-305-8. There were enough believers in Ireland.
- (3) The Odin Stone and the Orcadian wedding. <http://www.orkneyjar.com/history/odinstone/>
- (4) M.Emin Bozarlan (1995/2005) Mem û Zîn Ehmedê Xanî. Weşanên Deng.
- (5) Amed Tîgrîs, Nîşan û Dawet,(1991), weşanxana APEC, Stocholmê.
- (6) Navbenda êzdîyan ya kulturî û civakî; Laliş, Şêxan
<http://www.ezidi.dk/index.php?lang=ku>
- (7) Celîlê Celîl û Gulî Şadkam, Sêxiştîyên Kurmancên Xorasanê, Wiyena (2012) Înstîtûta Kurdzanîyê, Wiyana.
- (8) Dr. Huseyin Bektaş,(2003), Anatomiya bedena mirovan. Weşanên Deng.
- (9) Malperra Ellah mezarê, Dengê Kurdên Xorasanê, <http://www.ellahmezar.ir>